Li gor nerîna min giringe ku her çar yekîtî xwe nêzîkî hev bikin û li ser maseke rastiyê rûnin û çend pirojan pêşniyar bikin û li ser wan li hev bikin. mîna belavkirina kovareke toreyî yan lidarxistina Mihrecana Hebesta Kurdî yan Roja Çîroka Kurdî.

Ez vê banga xwe ji her çar yekîtiyên nivîskaran re rêdikim da xwe nêzî hev bikin û wek nivîskar û rewşenbîr biramin ne wek siyasetmedar çimkî partiyên me dûvikin ji partiyên Kurdistanî re. û van partiyan destên xwe dirêjî navrêxistinên sivîl jî kirine û ew jî parçe kirine. tevlû ku rola wan gereke alîkarî bana ne ku nexweşiyên xwe kiribana nav yekîtiyan.

Cihê serbilindê ye ku çiqas bobelat û şerê birakujiyê li Başûrê Kurdistanê çêbû lê yekîtiya Nivîskarên wan ma yek ji hev cuda nebû::::

Yên Desthelatdar Berpirs In Di Ber Gel De

Wexta ku mirov bixwaze milet bi xaka xwe re bê girêdan. pêwîst e pêdêvyên jiyanê bêne peydakirin. Da ku karibe li ber xwe bide pir pê ve mijûl nebe. çavê xwe jî ber bi revê ve beloq neke. bele di dema îro de em bi çavê serê xwe dibînin bê gelê Rojava yê Kurdistanê di çi rewşê de jiyan dike. ji hêla abûrî ve. Bê gûman ev rewşa awarte bandoreke pir xerab li roj û jiyana wî dike. Ku roj bi roj pêdiviyên jiyanê kêm dibin bûha jî dibin. Wekî em dizanin bê rêjîma Sûryayê bi çi rengî şerê kurdan dikirin. da ji deverên xwe koçber bibin û bajarên kurdî bêne valakirin.

Rêjîmê siyaseta li ser dida meşandin. Çimkî tu kes nikare berberyê bi birçîbûnê re bikşîne. lewra bê xwarin jiyan berdewam nabe. yanî bela tu kes gotinên qelewî bê sûde ji mer şîrove nekin. serê xwe pê mezin nekin. Di vê hêlê de divê mirov vekirî û zelal be. Ji ber gotin tu carî birînan derman nakin wekî derziyê bencê ne demkî ne. belê ez vê pirsê dikim. ma gelo her yekî ji Rojava koçber bûye ji bitrî çûye. yan jî hinek pirsgirêkên koçberyê hene...:? Gava mirov bi duristî bişopîne û lêkolîn bike wê gelek rastî dakevin holê. Çimkî gelek ji penaberan ji neçaryê baz dane. Yanî ez dikarim bêjim. pisgirêkê neçarya berdewamya jiyanê dîtin di civaka me de rojane derbas dibin. mixabin tu çare jê re nayêne dîtin. Yan jî bi lewazî di ber cava re tê derbaskirin. tev li wiha jî gelek welatî dibêjin em ji Rojava naçin. hetanî em karibin lê jiyan bikin. ji ber rûmeta mezin xwedîderketina xaka welat e. tevlî ku kêrê hestî jî derbas kirine û roj bi roj rewş ber bi xerabûnê ve diçe. ji loma car carna çi di dilê me de hebe em tînin ser ziman. û gava derî di riwê me de têne girtin her kes neçar dimîne li ber kişandina zahmetiyan. Sedema yekemîn ji vê rewşa abûrî ya awarte re dorpêçkirina ji her çar aliyan ve. ya duyem daketina nirxê pereyên sûrî ji ber vê qêrana ku sala pêncan derbas kir em nizanin bê wê kengî bi dawî bibe.

Belê em wekî kurd. divê li ber xwe bidin ne hema teqînek rû bide em çavê xwe li re vê bigerîne. ez vê yekê ji wan kesên ku karîbûn jiyana xwe li ser xaka xwe berdewam bike. Nexasim piştî serkevtiyên lehhengên YPG û YPJ ê li dijî tîrolîstan kû deverên me jiwan hatine paqijkirin . û ji ber aramiya xwe ji hemî deverên Sûryayê berê xwe ber bi Rojavayê Kurdistanê ve vekirine. Bi sed hezaran lê bûne neştecî.

Lê çima em xwediyê cih bi hesanî jê direvin. qutbirîne pê re dikin lê jî xwedî naderkevin...:

Ev yek nayê wê wateya ku ez dev davêjim welatparêziya gelê kurd. Lê gava hewcedarya welaê me bi me hebe em wî li paş xwe bihêlin bi rastî ev yek cihê rexin û mixabinyê ye. Belê piraniya wan kesan li berxwedan lê man neçar û bê hêvî.ku nema karîbûn jiyana xwe berdewam bikin. ev yek ji sedemên ku berê xwe dane welatê xerîbiyê bi sedan ji wan canê xwe kirin xelatiya koçberyê xwe û malbatên xwe radestî pêlê deryan. lawerên daristanan û bazirganiyên bê bext û wijdan kirin. Belê hin pirsgirêkên din jî hene destê wan di vê koçberyê di gelek xalan de hene. Yek ji wan xalan ku van kesên penaber bûn tu kes li dora xwe nedîtin. destê alîkiriyê dirêjî wan nehate kirin. nej rêverberê. ne ji saziyên civaka sivîl ne ji komele yan jî ji netewên yekbuyî. ta ku pirsgirêkên wan bêne çareserkirin ji ber gelê me di vê demê de hewcedarî olîkarya pêdêviyên rojane ne. lewra li deverên aram ku pêdêviyên jiyanê rasteser bibin wê çima xelek berê xwe bi riya çûn û nehatinê vekin ev yek. Ya duyemîn ku gelek ji bazirganan li ser xwîna şehîdên me gepa nanê vî gelê lê dikine agir. ji loma xelkê êdî nema dikarîn têr xwein bixwin. Di bin gelek navan de. riyêngirtê. komê çete. buhabûna dolar îro em tev de zanin rewşa awarte ye zehmetî hene. Lê gerek negihê wê wateya ku mirov xwîna birayê xwe bimije. Lê mixabin ku piraniya bazirganan deh qat nirxên alavên xwe zêde dikin. li tu kesî napirsin. belê divê rê ve berî û saziyên wê baş bi karê xwe rabin karê bazirganan bişopînin û bi tundî wan kesê bi gepa xwarna feqir û perîşanan bilîze ceza bike. Da ku tu kes ji wan xetê sor derbas nekin. Ji ber milê abûrî di şoreşan de milê herî sereke ye. Ma gelo gava milet birçîbûnê ve mijûl be ew ê çi bîştgiryê bidin hêzên leşkerî. wê çi berxwedanê li hemberî dijminan bikin. Çimkî gava ku mirov bixwaze gel ji warê xwe dernekeve Pêwîst e xwedî lê derkevin pirsgirêkên wî çareser bikin xwestek û armancan pêk bînin. Belê gava tu geşbînî . xweşî di jiyanê de nebin. wê çaxê tu kes ji me nikare wan kesan tewanbar bike bi xiyaneta axa welatê xwe. Çimkî gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê ji berî sedê salan li benda vê dema zêrîn bû da maf û azadiya xwe bidest bixe. Êdî di vê dema balkêş de divê her yek ji me bi erkê xwe rabe çi berpirsyar. kesayet. siyasetmedar. rewşnbîr. ji ber her yek ji bo xwe dike her yek xwedî li xwe derkeve. li xwîna şehîdan derkeve belê em bi hêvî ne ji kesên berpirs ku sînga wan fireh be da ku karibe hemû gelê li deverê dijîn himbêz bike bê cûdahî. Bela bi guman bin gava yek ji me rexnekê dike ji dilêşîkê dike çimkî bê rexnedarî serkevtin çênabe û divê rexnê gel cihê rizdariyê be ji ber ew kesê rehştine bar ew nûnerê hêviyê me ne. E z jî di wê gûmanê de me ewê karibin di rojên pêş de pirsgirêkan çareser bikin û birînan derman bikin da em karibin jiyanek bi rûmet û hevbeş li ser xaka xwe jiyan bikin.

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

AvakirIna Civakê Ji Kê Tê Xwestin


Mihemed Kose

Bê guman rola rewşenbîran roleke giring e. di jiyana milEtan de wek hûn dizanin ku em bixwazin welatekî ava bikin berî her tiştî divê em miletê xwe ava bikin ji ber ku milet welatan ava dikin.

bi çi rengî em ê karbin civaka xwe bi bingehekî netewî xurt ava bikin .ji kesên xwe dibînin zane û rewşenbîr. tê xwstin ku karekî di nav milet de bikin bi çi rengê ku ji wan tê xwestin her kes ji aliyê xwe de rabe tiştê li cem wî hebe bide . wek zimanzanên me çi hînkarê ziman be yan jî hunermendên me yan jî jîrên rewşa civaka sivîl .

em ji hev venaşêrin gelek ji me re divê ku bi vî barî rabin ji ber ku hîna jî miletê me ne gihiştiye wê baweriya xwe . em ê bînin ser ziman hîna jî zimanê me perçe ye di her çar perçeyên Kurdistanê. dema em karibin zimanê xwe bikin yek bi rengê fermî wê dûv re welatê me jî bibe yek helbet divê li ser rêbazeke dirustî be û yek war be . di baweriya min de wê girêdana milet bi hev re xurtir bibe û ew hastên netewî wê gurtir bibe . ya din dîroka me kanî çima bi rastî nadin xuyanî tiştê bi serê me hatiye ji ber ew şaşitiyên berê ku em tê de derbas bûn û çi kêmasiyê me hene neyê dûbarekirin . Mixabin lê gelek ji me re divê . barê milet barekî giran e yek bi tena xwe nikare vî barî hilgire .

ya din civak û mala kurd gelo serast e. ez dibêjim na ne çaresere . çima ji ber ku hîn jî me xwe nas nekiriye ka ew rewşenbîrên me ku karibin dakevin nav milet û dev ji karê siyasî berdin û bi karê civakî di nav milet de bikin ka emê ji malbata xwe dest pê bikin û dûv re ji taxa xwe û bajarê xwe . wê demê em Karin bêjin em xwedî milet in û welatin . bawer bikin ji min em nabin xwedî welat dema em hez hev nekin .

Di Navbera Welêt û Penaberistanê De

Ebas Mûsa

Çi ne ew tiştên ku dihêlin jiyan normal be yan jî awarte be? Helbet jiyana civakî avakiriye li ser bingeha tişt û kiryarên dûbarekirî. loma guhertin nearamiyê diberdindamarênwê. berûvajîvêrotînê jiyana awarte ewe ya ku ava dibe li ser pişta guhertin û bûyerên mezin. Ji ber ku civak di koka xwe de li aramî û hedanê digere. çi tevger be jî lerzekê dixe aramîya wî. lê dema ku şepêla guhertinê tê û pê ve. civak bixwe ji hev dikeve. û nearamî li çokan dikeve û êdî hêdî hêdî rengê xwe li gor jiyana nû (ya awarte) divede.

Li Rojavayê Kurdistanê civak ji qonaxajîyananormaljipênc salan û vir de derketiye. lê di van pênc salan de ne tenê jîyaneke awarte qedand. lê jiyaneke tevlîhevî cêwî awarte lê normal di heman demê de.

Şer û penaberî. Şer û penaberî du tiştên herî serke bûn ku jiyan li Rojavayê Kurdistan û şixwe li Sûryayê bi tevahî guhertin. lê guhertinin tund. ku civak tert û belav kirin û serûbinî hev kirin. bi sedema şerê dijwar benaberîyek bêhempa çêbû. tevî ku şerê tund û dijwar li seranserî Sûryayê hebû lê şerê herî tund ne li Rojavayê Kurdistanê bû. belam penaberî bêhempa bû.

Li welatên ku şer li wan diqewime civakêdîhêdîhêdîdikevekirasêwê nearamî û awartebûnê de. civaka Îraqê. paşî 2003an û derbasbûna Amrîka kete heman qonaxê de. lê dixuye ku civak nikare wî hestî binasî ger ew bi xwe tê re derbas nebî. Şer li talda te be jî wê hestê tenehejînedemakubibekiryareke rojane. lê wê hestê mirov serûbinî hev bike dema ku şer di bin çengê te de be. loma di şerê dawî de yê ku li Qamişloyê qewimî civak ji jiyana xwe ya normalî awarte derket û tirsê xwe berda damarên civakê. Penaberî ew jî ji wan tiştên ku jiyana civakê guherand. ji ber ku malbat ji hevdeketin. di rêyên mirinê re yê zor û zehmet. berû bi welatên Rojavayê de. Malbatên li wir bi zarokên xwe yên li welêt de diaxivin. zarokên li wir bi malbatên xwe yê li welêt diaxivin. ciwanên li wir yên ku di rêyên mirinê re derbas bûn ta gihaştin penaberiya xwe ya dilêş bûkên xwe yên xweşkok dughezin û li bende wan dimînin hetakuqanûnênwan welatan libejna wan bê. Enternetjî ew alava herî sivik û lezok ya ku êş û azaran di be û tîne di navbera welêt û penaberistanê de. Li Rojavayê Kurdistanê îro ro jiyana normal û awarte tevlî hev bûye. ji ber ku dolabê jiyanê geroke. carnan bipêş de diçe û carnan radiweste. lê carnan mîna destar digere tiştan di nava xwe de dihêre û dema radiweste êşan didirîne.

Di Çanda Kurdî De.. Dawet.

Dilazad Art

- Çend Gotin

Dawet (anku zemawend) beşeke gelekî girîng e ji beşên çanda gelan. Ji ber ku dawet destpêka avakirina malbateke nû ye. di hemû çandê cîhanê de cihekî girîng digrin. Dawet rengên netewan e. Ji ber vê ye ku bi hezarên sala ye dawetên gelê me li cîhanê deng vedane. Bi listîkên xwe. bi edetên xwe. bi kevneşopiyên xwe. bi stranên xwe. bi cil û bergên xwe dawetên Kurda di çanda cîhanê de cihekî rengîn ji xwe re girtiye.

Lê mixabin roj bi roj ev rengên Kurdî ji nav dawetên me radibin. Lê kêm devera dawetên ku bêhna Kurdî ji wan tê mane. Lê bajarên Kurdan ti cudatî di navbera dawetên cîran de an dawetên Ewropiyan û ê Kurdan de nemane. Dawetên wan li salonên daweta çê dibin. Bûk û zavê dixine mîna qeşmera. Ew giraniya bûk û zavê ji rûyen wan hatiye avêtin. Ji bedela govendên me dansên biyanî ji xwe re xistine adet. Dema ku mirov ji dûr ve li dawete Kurdê îro temaşe dike ti rengê Kurd û Kurdistanî nabîne. Ne stran. stranên Kurdî ne. ne cil û bergên Kurdî ne. ne lîstikê Kurdî ne…

Di vê lêkolînê de min xwest ez dawetên bi rengê Kurdistanî bi we bidim naskirin. Min nexwest ev çanda rengîn winda bibe. Ez dizanim tiştê hate nivîsandin nayê windakirin. Bi vê armancê min ev nivîs nivîsand. Di serî de ji bo alîkariyê ji dayîka xwe Latîfa re dûv re jî ji xaltîka xwe Asya re spasiyên xwe pêşkêş dikim.

- Hin Edetên Dawetên Me

Darikê Zavê: Dareke bi gelek şax û bi şekir û bi xirxirka xemilandî ye. Dema ku bûk gihaşte mala zavê. darikê zavê li serê banekî dihilweşandin. Ew şekir û xirxirkê ku hilweşiyan bi coşeke mezin didan hev.

Sewîlê Bûkê: Nava sewîlek bi şekir û bi perê hûr tijî dikirin. Dema ku bûk gihaşte mala zavê li berê bûkê dişkandin. Zarokan xwe davêtin şekir û peran.

Pişt Dêrî: Dema ku bûkê ji malbavan derdixin ji rexê nasê bûkê ve derî digrin. Ji ber ku derî vekin ji zava diravan dixwazin. Heta zava pera nede derî lê venakin.

Sersebet: Dema ku rihalê bûkê dibin mala zavê. mirovek li ser sebeta bûkê dirûne û ji barkêşa diravan dixwaze. Heta dirava bidest nexin nahêlin ku sebeta bûkê ji cihê wê rakirin.

Şekala (Pêlav) Bûkê (ji bo ku bidin zavê): Ji bo xelat ji zava bistînin pêlava bûkê dibin ji zavê rê. Zava jî ji bedela pêlava bûkê xelatekê dide kesê ku pêlav aniye.

Destmala Zavê (ji bo ku bidin bûkê): Ji bo xelat ji bûkê bistînin desmalka zavê dibin ji bûkê re. Bûk jî ji bedela desmala zavê xelatekê dide kesê ku desmalk anîye.

Serdoşek: Xelata ku didin kesên ku doşeka bûk û zavê dirûtiye.

- Kevneşopiyên Dawetan

1. Cirîd
2. Kahrê Aziba
3. Mewlûd
4. Hinekirina destên bûk û zavê
5. Li ber piyê bûkê şikandina qedehan
6. Dema ku bûk ji mala bavê xwe derdikeve ji hêla bav an birayê wê ve qurdelaya sor

Dawetên wan li salonên daweta çê dibin. Bûk û zavê dixine mîna qeşmera. Ew giraniya bûk û zavê ji rûyen wan hatiye avêtin. Ji bedela govendên me dansên biyanî ji xwe re xistine adet.

sê cara li bejna bûkê tê girêdan û tê vekirin. Cara dawî giredayî dimine.

7. Rêgirtin ji rexê zarokan ve ji bo siwarêyen bûk û zavê
8. Zerfa Diravan
9. Belavkirina hinê li keçikan
10. Xelatkirina bûk û zavê
11. Sersibehiya bûkê

- Listikên Dawetan

1. Delîlo
2. Govend
3. Hurîzî
4. Sêgavî
5. Çargavî
6. Milanî
7. Çepik
8. Şêxanî
9. Bagiyê
10. Şemamê
11. Bablêkan
12. Şêrîzdîn

- Stranên Dawetên Me

5.1 Kî Zava Kî Zava

Ev stran li ser bûk û zavê tên gotin. Ev stran bi awaye ku lihev vegerînin tê gotin. Stranbêj rêz bi rêz dibejê duv re guhdervan dubare dikin. Bi çelpika forma wê tê girtin.

- Zerî zavana lo zerî zavana
- Wey (navê zavê) zavaye lo (navê zavê) zava ye
- Zavakê şêrîn birane wey zavakê şêrîn birane
- Nebêje min nabe wey lo (navê zavê) ne bêje min nabe
- Sehê naçe tavê wey sehe naçê tavê
- Reşkula mala bavê wey reşkula mala bavê
- (Navê bavê zavê) xelat e. wey (navê bavê zavê) xelat e
- Şev reş e. neçe civatê lo (navê zavê) şev reş e neçe civatê
- Kî zava kî zava (navê zavê) bejin zirav e
- Kî bûke kî bûke (navê bûkê) hine li neynûke
- Kî berbûkî kî berbûkî (navê xwişka zavê) di cî de wer bê
- Kî xêlî kî xêlî (navê birayê zavê) tifing bi têlî
- Kî nanpêj kî nanpêj (navekî nêzîkî zavê) tilî dirêj
- Kî firaxşo kî firaxşo (navê keçikekê) çenk dirêj
- Kî cilşo kî cilşo (navê keçikekê) dest şûnik

5.2 Kekêmino Zava

Ev stran li ser zavê tê gotin Ev stran bi awayê ku li hev vegerînin tê gotin. Stranbêj rêz bi rêz dibêje dûv re guhdervan dubare dikin. Bi çepika forma wê tê girtin.

- Şam û Heleb. Diyarbekir. kekê min o zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir. ser xêrê be zava
- Min bazara bedlê te kir. kekê min o zava
- Min bazara bedlête kir. ser xêrê be zava
- Min jibîr kir ûtî nekir. kekêmino zava
- Min jibîr kir ûtî nekir. ser xêrê be zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir. kekê mino zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir. ser xêrê be zava
- Min bazara qundira te kir. kekê mino zava
- Min bazara qundira te kir. ser xêre be zava
- Min jibîr kir boyax nekir. kekêmino zava
- Min jibîr kir boyax nekir. ser xêrê bê zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir kekê mino zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir ser xêrê be zava
- Min bazara hamawîya te kir. kekê mino zava
- Min bazara hamawîya te kir. ser xêrê be zava
- Min jibîr kir reşî nekir. kekê mino zava
- Min ji bîr kir reşî nekir. ser xêrê be zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir. kekê mino zava
- Şam û Heleb. Diyarbekir. ser xêrê be zava

5.3 Hine

Ev stran li ser bûk û zavê tê gotin. Ev stran bi awayê ku li hev vegerînin tê gotin. Stranbêj rêz bi rêz dibêje dûv re guhdervan dubare dikin. Bi çepika forma wê tê girtin.

- Hine hine. sed û di cara hine
- Hine di teştê kin
- Destê bûk û zavê kin
- Hine ji hina Musilê
- Anîn bi elban hasilê
- Lêkin destê sorgulê

5.4 Xerîbiyê

Ev stran li ser bûkê tê gotin. Yek kes dibêjê û ê din bi çelpika ritma wê digrin.

- Xerîb xerîbiyê
- Çola Bişêriyê
- Xwelî li serê te zêriyê
- Xerîbeka Xwedê me
- Dara devê rê me
- Hesreta mala bavê me
- Xerîb here were
- Çêke tayij û bere
- Taştê bixwe dîsa here
- Xerîb çûye dara
- Li xerîb bûya êvara
- Werîs lê biba mara
- Xerîbeka azmana
- Sabûnka qizwana
- Li ser serê gundî û cîrana
- Xerîb ez bi gorî
- Teşta tijî morî
- Xerîb çûya taxa jorî

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermend Reşîd El- Sûfî Ji Bûyerpress Re Daxive:

- Hikûmeta herêma Kurdistanê Tiştek ji min re nekir, min jî xwe ji wan re pêşkêş nekir.

- Ji siyaset û stranê siyasî hez nakim.. Nikarim li ser kesayetan bistrêm

- Şivan Perwer ket warê siyasî, gerek hunermend ne têkildarê siyasetê be, divê behsa welat bike, şehîdan bike. Siyaset merov dadixe, û Şivan Perwer jî daket

- Stranek min heye 40 deqe ye, û 32meqam tê de hene, min hîn tomar nekiriye

- Dema ku "Mihemed Selman" wezîrê ragihandinê bû, ez gelekî hezkirî bûm, mûçeyê min jî wê demê pênc hezar bû.

- ez ji kilîpê erzan hez nakim, dema ku keçek bi min re reqsê bike û xwe bihejîne,

- Di sala 1979an de, hunermend Riyad El sinbatî û Belîx Hemdî bi xwe li ahengeke min amade bûn.. Gelekî ji dengên min hez kirin.

Hevpeyvîn: Qadir Egîd

-Di serî de em dixwazin ku hun hinekî li ser kurte jiyana xwe baxivin?

Reşîd Sofî. ji Bajarê Kobanî ye. di sala 1953an de hatime diniyê. Piştî min "Bekeloriya" di sala 1978an de bidawî kir. ez çûm welatê Mesrê min mûzîk xwend. ez li ser hesabê xwe çûm. li wê derê. Dar Elopera û Peymangeha Bilind ya Mûzîkê bi barê min rabûn. û bawernameyek sembolî dane min. ez li wir pêrgî hemû awazjenên wan bûm. Mihemed Ebdilwehab. Belîx Hemdî. û Riyad Elsinbatî. min di sala 1985an de li bajarê Helebê peymangehek mûzîkê vekir. û ders lê dan. ew jî derdora du salan berdewam kir. dûv re ez çûm Şamê jî min ders dan. paşê min dersên "Meqamatan" li Peymangeha Bilind dan. Ji ûdjenên yekem li ser asta cîhanê tême hejmartin.

Di jîngeheke oldar û sofîtî de rabûme. lê oldariyek ne hişk û dijwar bû. bavê min Miftiyê Gîştî yê Kobanî bû. gelek helbestên Melayê Cezîrî digotin. me jî piçûkanî Quran jiber kir. dengê min xweş bû. min dixwend û bang û azan dida. bêtir em li ser guhdarkirina stranên Erebî mîna Mihemed Ebdilwehab. Ferîd. Um Kelsûm rabûn. lewre jêhatîbûna min di meqaman de ji wir hat.. ji hêla malbatî ve jî ez hîn xort im. nezewicî me.

- Kengî Hunermend Reşîd Sofî ji mûzîk û awazan hez kir?

Di sala heftê de. ez şagirtê pola Heyştan bûm. mamosteyek me yê mûzîkê li dibistanê hebû. heftane. û her roja Pênşemb û Duşembê dersek mûzîkê dida me. min radihişt ûda dibistanê. mamoste ji min re digot tê zû fêr bibe.min jê xwest dersekê bide min. roja dî ez hatim û min dersa xwe jiber kiribû. yeke dî da min. min ew jî jiber kir. û herweha . dawî gote min ez nema didim te. tu zû fêr dibî.

-Gelo raste hûn ji bo xwendina Olî çûn Misrê?

Piştî min xwendina "Bekaloriya " bidawî kir. ez çûme Misrê. û çûna min ne ji bo xwendina olî bû. ev tişt qet tune bû. ev gotegotin. ez bi taybet ji bo xwendina mûzîkê çûbûm. Hindek dibêjin bavê wî ew şandiyê ta oldariyê bixwîne. û dawî dema Reşîd vegeriya amûra ûdê bi xwe re anîbû. ev yek qet ne rast e. bavê min bi xwe Miftî bû û min ol li gel wî xwendiye.

- We gelek awazjenê Ereb yên navdar li Misrê dîtin. li ser wan dîdara û navan baxive?

Ez du salan li Misrê mam. min gelek hunermendên mezin dîtin. gelek dezgehên ragihandinê mîna ya "Sewt Elereb" . "Misrê" û "Peymangeha Bilind ya Ahengan" hevpeyvîn bi min re kirin. Di sala 1979an de. hunermend Riyad El sinbatî û Belîx Hemdî bi xwe li ahengeke min amade bûn. ev kesên payebilind di mûzîkê de. Gelekî ji min û dengên min hez kirin. min ji wan re helbestên Erebî digotin wan jî jê hez dikir. min şevbuhêrk li Qahîre li dar dixistin.. di wê demê malbatê nûçe dane min gotin bavê te pir nexweş e. lewre ez ji bo wî vegeryam. lê ez nema çûm Misrê ji ber rewşa siyasî di navbera Sûrî û Mesrê de nebaş bû. Dema ez ji wir vegeryam jî gelek serêşî ji min re hate kirin. dipirsîn tu çûbû çi. û te çi dikir.

- Li gor ezmûna te ya kesayetî.di nerîna te de hunermendê Kurd li deverê rastî çi astengiyan bi gîştî tê?

Hunerî hewceyî valabûn û aramiyek dirûnî. bi taybet ji hêla siyasî ve. eger zexta siyasî li ser hebe ew hunermend têk diçe. ji ber mecbûr dibe ku destê aliyekî li ser hesabê yê dî bigre. divê di warê huner û mûzîkê de partiyetî tune be. merov nebe alî. tenê merov li aliyê huner û mûzîka xwe bisekine. ew partiya merovê hunermend e. ez merovekî welatperwer im. ji welatê xwe hez dikim. lê dûrî siyasetê me.

Astengiya aborî jî heye. hunermend gelek zehmetiyê dikişîne. tomarkirin gelek lê xerc dibe. Ê min gelek hene dixwazin ez li gel wan tomar bikim. ew jî weke dengekî ji wan re ye. niha li Bakur ji min dixwazin ez herim ji wan re tomar bikim. Orhan Gencebay ji min xwestiye. lê hindek pirsgirêkên sînorî hene. ez ê nêzîk herim.

- Gelo hunermendên li Rojava dikarin ji hunera xwe nan bixun û bijîn?

Na. qet nikare. ya divê aliyek fermî mîna "çand û huner" alîkariya wî bike ku ew li gel wan bibe karmend. yan jî divê ahengên dawetan lidar bixe ta ku jiyana xwe birê ve bibe. û di nerîna min de jî ew ne huner e.

Min bi xwe ta niha tiştek madî û aborî ji mûzîkê wernegirtiye. jibilî dema ku min li bajarê Şamê ders didan.

- Kî helbest û awazên hunermend Reşîd Sofî datîne?

Bêtir helbestvan Mihemed Salih ji Kobanî ji min re nivîsandiye. strana "Xweziy Hêvî. û Gulistana Dil" yên wî ne. stranek min li ser "Helebçe" heye. ew helbesta Ehmedê Huseynî ye. "Ez Mêvanê Dilê Te Me " helbesta Mihemed Emîn Sîdo ji Amûdê ye. hemû awazên stranên min yê min in. ez ji xwe re çêdikim. Strana "Çûme Ber Çemê Êvarê " ya min e. min tenê ew helbest nivîsiye. ez dikarim gelek helbestan binivîsim. lê ez naxwazim çend şebeşa bi yek destî - wek hunermendên van rojan -rahêjm. pisporî xweş e.

- Çima tu xwe di warê strana siyasî de nabînî?

Ji siyaset û stranê siyasî hez nakim. û nastrêm. min strana "Evîna Te Pir şêrîn e Li Ber Dilê Me Pir Buha Bû" li ser Kurdistanê straye. strana "Newroza Min Kurdistan e Bihna Wê Gul û Rîhan e" ew jî li ser Newrozê ye. ji stranê niştimanî hez dikim. lê nikarim li ser kesayetan bistrêm. min strana "Em Pêşmergên Qehreman" di sala 1977an de çê kir.

- Bajarê Kobanî ji hêla "Da'iş"ê ve dagîrkirî bû. û şervanên Kurd ew rizgar kirin. tu piroje tunene ku tu stranekê li ser wan bêje?

Strana Kobanî piraniya wê li ser wan e. dema ku ez dibêjim:

Warê şêran xweş Kobanî
Deşt û zozan mêrg û kanî
Li her şopa pakrewanî
Bi dilsozî bi mêranî
Eyeşe Nûr e. Mişte Nûr e
Bi awazî birîn kûr e
Ew jî helbesta Stêrê Çello ye. ez bêtir dixwazim stranê evînî û civakî

Dema dûrî Kobanî dikevim, wenda dibim, dema wenda dibim ez diçim li Kobanî li xwe digerim.

û herweha yên niştimanî bêjim.

- Strana herî li ber dilê Reşîd Sofî şêrîn e?

Meynenoşê.. ji ber ew yekem stran bû min di sala 77an de çêkir. ew jî gotinê Melayê Cizîrî ne.

- Te çima ji destpêkê de xwe spart van helbestên giran û resen?

Sedem jî ew bû.ku di wê demê de helbestvan û mûzîkjen kêm bûn. dîwanê Cizîrî li ber destê min hebûn. difikirim nêzîk tiştekî ji Cegerxwîn re bêjim. Seydayê Tîrêj ne bi Qeweta Cegerxwîn e. lê mixabin qet tu têkilî di navbera min û Seydayê Tîrêj û Cegerxwîn de çênebû. Di nerîna min de helbesta ku tu bikî stran divê xurt be. hestê te tev bide.

- Tu caran helbest ji te re hetine pêşkêşkirin û te nestraye?

Rast e. hindek ji min re dihatin lê qafiya wan nelihevduhatî bû. gelekan xwe dikirin helbestvan. lê min ji wan re digot ev ne helbest in. min dixwest ez helbestên bilind û xuya bin. Helbesteke Seydayê Tîrêj heye ez xwe hazir dikim ku ez bêjim.

- Çima vîdyo kilîpên hunermend Reşîd Sofî tune ne?

Na . tune ne. min ji vê meseleyê hez nekir. ez ji tiştê eciqandî hez nakim. eger ez rojekê vîdyo kilîpekê çêbikim. ez ê yeke sivik li siruştê. li nav daran çêbikim. ez ji kilîpê erzan hez nakim. dema ku keçek bi min re reqsê bike û xwe bihejîne. ji ber ev yek ji temenê min re ne munasib e. ya didwa yê temaşevan nema li stranê guhdar dike. wê bi çavê xwe guhdar be.

- Te tu aheng li derveyî welat pêşkêş kirine?

Di sala 2004an de min ahengek li Okranya lidar xist. yek li Mosko jî di sala 2005an de. min li Mesrê jî û li Şamê li pirtûkxaneya Esed çêkirin. min li zanîngehê jî yek lidar xistiye. Lê ahengên li Kazîno ez ji wan hez nakim û çê nakim.

- We Ta Niha çi xelat wergirtine?

Sendîkeya Hunermendan li Şam. Helebê. û Humsê min xelat kir. li Herêma Kurdistanê ez hatime xelatkirin. û ji xwe îro Arta fm. jî min xelat kir.

- Weke hunermendekî ûdjen tu di Sendîkeya Hunermendên Sûrî de qeydkirî yî?

Erê. rast e. û dema ku "Mihemed Selman" wezîrê ragihandinê bû. ez gelekî hezkirî bûm. mûçeyê min jî wê demê pênc hezar bû.lê mixabin gelek hunermendên Ereb di wê demê de ji min aciz bûn. girê xwe ji min girtin. çawa ev ê kurd wisa cîgirtî ye. rabû ez çûm gel Ebdiselam Hicab. Rêvebirê Dezgehê. min jê re rewşa xwe şîrove kir. ji min re got xema nexwe ez li pişta te me. lê ew jî piştî demekê ji wê deverê hate vuguheztin. nakokî pir bûn rabû min dest jê berda.

- Reşîd Sofî çima 'ûd ne tenbûr?

Ji ber ûd amûreke fireh e. lê Tembûr tiştan gewde û teqzîm dike. û Ereb dibêjin:

إذا كانت كلّ الليالي ليلة القدر
فأيّ قدر لليلة القدر

Mebesta min eger em hemû tembûrjen bin. wê kî ûdjen be. dûv re ûd amûreke kevn e ji serdema Ebasyan de ye. Pêşî perdeyên tembûrê tune bûn. niha her kes li ser perdeyan lê dide. anku rêbaz û delîleke wê heye. lê yê ku dixwaze di mûzîkê de xurt bibe divê li amûrekî azad û serbest bixe. anku amûrekî "HUR" mîna ûd. keman û qanûn. Ji bo awazan mîna ûdê nîne. awazjenên tembûran herdem qels in.

- Şêweya ku hûn stranê xwe çêdikin û dibêjin giran e anku "Terb"e. hun nabînin ku nifşek heye jê re hin şêweyên stran û. mûzîkê taybet divin?

Ez dikarim. lê tê naskirin ku ez jibilî tiştên kevn û giran –anku tereb- nabêjim. wek mînak strana "Çûme Ber Çemê Êvarê" sivik e. lê xweş e. yan strana "Ez Mêvanê Dilê Te Me" ew jî li gel min sivik e. lê ji yê guhdar re ne sivik e.

Stranek min heye 40 deqe ye. û 32meqam tê de hene. min hîn tomar nekiriye. ew jî dibêje:

Çavê yara min sed hezar reng e
Cejn û evîn e . aştî û reng e.

Ew ji helbestên D. Nîdal Hisên ji Mosko ye. Stranek din jî heye ew jî hîn tomar nebûye. dibêje:

Tu bi xêr hatî mala me
Gelek şa bû dilê me

Ev stranên bûrî eger ez werim tomr bikim ez ê wan diyarî Qamişlo bikim.

- Berî şoreşa Sûriyê we li Kobaniyê çi dikir. çi karê we bû?

Girupek keç hebûn min ew fêrî mûzîkê li ser keman û ûdê û deng dikirin. hindekan ji wan bidawî kirin. niha li Kobanî derdora bîst keçan li ûdê didin.

-Piştî ku şoreş li Sûriyê vêket we li kobaniyê çi ji bo vê Şoreşê pêşkêş kir?

Şoreşa Sûrî gelekî germ bû. xwepêşandan heftane bûn. ez bi xwe dernediketim. carekê xortan min kişandin nav xwe. min nedixwest. ji ber ez mirovekî hunermend im. tev ku dilê min bi ser wan ve bû. piştî çend hefteyan wek nerîna min derket.

- Wek hunermend û kurê Kobaniyê li ser hestê xwe nexasim çaxa ku Kobanî hat dorpêçkirin. û êrîşa mezin li ser çêbûn bixave?

Wê çaxê gulleyên hawnan Ii derdorê Kobanê ketin. roja dî millet ji kobanê derketin. ez gelekî mam ta ez derketim. hêviya min hebû ez tê de bimînim. lê eger ez mabama xwarin nemabû. ez mecbûr bûm derkevim herim Tirkiyê

-Di wê êrîşê de we ji Kobaniyê bar kir. we çawe xatir jê xwest. û hun xwedî omîd bûn ku hunê vegerin Kobaniyê?

Min pir helbest. awaz. bîranîn li paş xwe hiştin. min pişta xwe da Kobanî. û ez meşyam ta gihiştim sînor. ez li Kobanî zîvirîm û min got: Ne xem e. ku payîz were û pelên min biweşin. lê ditirsim Buhar were û pelên min nepişkivin. Ji xwe min omîd û hêvî qut kiribûn. ez heyvekê li Tirkiyayê mam. dûv re çûm Herêma Kurdistanê. sal û sê heyva li wir mam. tev ku derketina Ewrupayê zor hesan bû. lê ez derneketim. ji ber derketina ji derve wendabûn e. merov ne bi dest xwe ye û ne ji xwe re ye. merovê hunermend milkê milet e.

-Berhemên we yên ku hatanî vê çaxê hatine tomarkirin?

Du kasêt tomarkirî ne. 23 stranên ne tomarkirî jî hene.

- Piştî ku tu vegerya Kobanî tu alîkarî bi te re bû?

Gelek telfon ji min re hatin vekirin. serokê Kantona Kobanî û wezîrên xwe hatin serdana min. encumena leşkerî jî hat. ji min pirsîn eger tiştek ji min re gerek e. vegera min li gel wan tiştekî pir mezin bû. alîkariya min ya madî jî kirin. malek dane min. ji ber mala min wêran bûbû.

-Gelek hunermendan stranê Reşîd Sofê gotine. lê strana te ya "Xwezya Hêvî" hunermend Yenal Tahir gelekî ew stran navdar kir. ew î destûr ji te xwest ji bo wê stranê bêje. û tu jî dibêjî erê ku ew stran navdar kir?

Ewî destûr ji min xwest. û min erê kir. strana min berê navdar bû. vajî wilo min jê re got te dengê xwe gelekî zirav kiriye. ne serkeftî bû tê de.

- We peymangehek ji bo mûzîkê li Kobaniyê vekir bû. ew kar hîn li dar e?

Niha ez wan li malê fêr dikim. gelek şagirtên min derketin. tenê du –sê keç mane. ez wan li malê fêr dikim.

Di tenahiya xwe de hun li dengê guhdar dikin?

Ez tu car li xwe guhdar nakim. ez bêtir li mûzîka Farisî guhdar dikim.hunermend Mihemed Rida Şeceryan. Hisên Elî Zade. li Erebî Mihemed Ebdilwehab. Kurdî li Şivan. Lê Şivan perwer jî ket warê siyasî. gerek hunermend ne têkildarê siyasetê be. divê behsa welat bike. şehîdan bike. Siyaset merov dadixe. û Şivan jî daket.

-We çi di jiyana xwe de winda kir?

Hêviya min hebû ku ez peymangehek mezin vekim. mîna Ekadimiyê.

- Eger stranek hevbeş ji bo we pêşkêş bû. hun kîjan dengî wek "doyoto" hildbjêrin?

Feqê Teyran. Têkiliyên me hene. û pirojeyek wisa heye di paşerojê de.

-Li herêma Kurdistanê çawe pêşwaziya we hat kirin. û we çi karê hunerê û konsêrt li wir kirin?

Tiştek ji min re nekirin. min jî xwe ji wan re pêşkêş nekir. divabû hikûmetê tiştin ji min re pêşkêş bikira.

Hun dixwazin ji bo mûzîka Kurdî çi projeyê pêşkêş bikin?

Pir hene. pêşî pirtûkek min heye dixwazim çap bikim. min lêkolînek li ser mûzîka hemû deverên kurdî daye hev û li ser taybetmendiya wan diaxivim.

-Hun çima beşdarî karê hunermend Dilşad Se'îd yê bi navê "Şengal "nebûn?

Baş bû. lê tu hest dibû ku te berya niha lê guhdar kiriye. tiştekî nû tê de tune bû. Ez beşdar nebûm. eger tiştekî wisa hebe ez ê bi tena xwe

Min pişta xwe da Kobanî, û ez meşyam ta gihiştim sînor, ez li Kobanî zîvirîm û min got: Ne xem e, ku payîz were û pelên min biweşin, lê ditirsim Buhar were û pelên min nepişkivin.

çêbikim

-Çi qîr hîn di hinavê Reşîd Sofî de maye. û dixwaze derxîne?

Dixwazim karekî gewre bi navê Rojava amade bikim. lê kadir û alîkarî jê re gerek e. eger ev yek bi cî were serkeftinek mezin e ji min re.

-Ku Reşîd Sofî dûrî Kobaniyê dikeve. çi hest pê re derdikeve?

Ez wenda dibim. û dema ez wenda dibim ez diçim li Kobanî li xwe digerim.

- Şîretek ji bo hunrmendê nûhatî?

Ji wan hêvî dikim ku xwendina xwe ya mûzîkî xurt bikin ta hestê wan xurt bibe.

- Gelo rojnamegrya Kurdî mifayê Reşîd Sofî dayê de?

Erê daye min. dibe ku kêmanî ji hêla min ve hebe. Gelek caran dixwazin min bibînin ez ne vala me. tev ku ev hevdîtin ji min re serbilindiyek e.

- Hun di nav hin mûzîkjenê Ereb de naskirî ne gelo?

Xweş naskirî me..hemû min nas dikin.

Gotina dawî?

Ne tenê bi hêvî me. baweriya min heye ku milletê Kurd bêtir pêş bikeve. bi hêvî me bibin yek.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Xemgînê Remo….. Helbestin Bijartî

RAZA HEBÛNÊ

Ji sarî ya xewnê min
Tu bizotek sor sincirî
Diherike tarî ya şevan
Li ber tîrêjê du çavên te
Ez morîkê hêvî ya darve dikim
Û çûkên elenda paşeroja
Di dilê min de dixwînin .....
Cîhanek mijokî
Di sarî ya sibeha de tevizî ye
Û rimî ya arê min
Sîsa ji êzingê tene
Ezê bendewarê buhara te bim
Ta ku xecxecok li dêmên te
Sor bibin ....
Û xemgînî ya ewan çavan
Bi vîna xwe her dê bişom
Û wê hêvî be
Ku di rojeke geş de
Te bibînim ....
Hingê emê bibin
Du qulingên gola Wanê
Û konê şahî yê
Li Sîpanê xelatê vegrin
Lê ne bi kesera Siyamend û Xecê
Belê tovê evîneke nû
Emê biçînin .....
Ax şêrîna min ....»
Ew çavên te yên xulmaşî
Rêwîtî ya sedê sala dinimînin
De ka were ...
Emê êş û kovana
Vîn û evîna
Li hevdu par kin
Û raza hebûn û nebûnê
Tê bighînin ...
Hebûna min bi te ye
Û raza
jîyanê tu
bi xwe
ye .....

ji berhemên wî yên çapkirî: Axîna Dil, helbest, şam 1991. - Keskayên Kizirî, helbest, şam, 1996, ji weşanên kovara Zanîn. - Şevên Deşta Mêrdînê, çîrok, Hevbendiya Kawa. - Ayetên çiya, helbest, Semakurd 2008. - Pêlên Evînê, stran, 2005. - Kepezê Xewna, çîrok, Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Dihokê.

XWEZÎ YÊN ÊVARÎ

Vê êvarê ...
Giyanê min sitranek divê
Ku çûkê bê zarî ya min
Bighîne baxçe yên şahî yê
Ey şaha şehneşînê min
Û sitran hemî bê canin
Ji xemgînî ya min re
Nabin derman ....
Êvarek bi reş ewrên tarî
Nixumandî
Û dorhêl pêkve toz û xwelî
Canê min jî
Asonî xunav girtî divê
Lê baran li vî warî
Nabin mêvan .....
Ey canê .... ؛
Cana bi can
Perî ya bi bagera re çû
Û bû xwezî ya dil û can
Xwezî tu niha kemaneyek ba
Li ser milê min .
Bilûrek ba di nav lêvê min .
Minê awazên jînê
Ji elenda hêvî ya re jenî ba
Bi sed meqam û pestan .....
Narîna min ...؛
Êş û azara dem xwarin
Û çavên dildara
Li rê veman ....
Ew barana me divî ya
Bi şûnde ma
Buhar jî di gel veman ...
Kêlîk bûne roj
Û roj dem û sal
Dîsa jî
govenda kund
nêzîk dibe
Û min
sitrana aştî
yê
Ji bîr nekirî
ye
Ku piştî
payîza bi
toz
Wê şîn
bibin

Di 17.5.1961ê de li gundê Talika Cemîl Paşa ku bi ser bajarê Dirbêsiyê ve girêdayî ye ji dayik bûye. Dibistana xwe ya seretayî li gundê Bîr Kinêsê qedandiye, û ya amadeyî û navendî li bajarê Dirbêsiyê.

nergizên ciwan .....

KEVALÊN TOROZ

Kolanên dirbêsî yê
Toroz dikin gelek keval
Û hemî keval sipehîne
Bînerê van dîmena
Şerpeze dimînin
Û ez yek ji wanim
Nizanim kîjan kolanê
bişopînim ...
Ku van neqş û nîgaran
Di dil û
çavên xwe de
binimînim ...
Û bo dildarê
van dîmena
Mêrdîna min
di şevê de
Gerdenî ya
keçek şêrîne ...
Hewar .....؛
Ez dildarê vê
keçkê me
Gerdenî ya wê
Bakur û başûr
Rojhşlat û rojava
Bi heve dighêne .....
Ez bi hûçikê wê ve
tême girêdan
Û guharên wê sêdara
min
Li dar dixîne ...
Keçko ...»
Buharên te çendî balkêşin ...?
Bi xwezî yên koçera
Ez kesera te dikşînim ...
Ku di sibeheke geş de
Pişta xwe bidme latekê
û dengê kewa awazên
Bilûr û sentûrê
Li guhê min bi jenîne
De xewin û xewin
Ezê li ber ba herim
Gurzeke gul
Li ser gora mem û zînê dînim
Li ber def û naya cezîrî
Enî ya selma yê maçkim
Û berê xwe bidme keleha
Dimdimê
Bi şûrê xanê lep zêrîn
Li gastîna çar çira
Tola qadî hilînim ....
Û gazî bikim ehmedê xanî
Ka nûbehara bi çûkan
Ji nû werîne ...
Mîrê helbestê ....؛
Dem hatîye
Ku hêvî yên te pêk bên
Û bi xencera Barzanî
Ezê perda şevê bidirînim ...
Di elendeke teze de
Wê ev sînorên derewîn
Biherifin
Û axîn û keser
Di navbera me de nemînin ....

PERAVÊN ŞAHÎ YÊ

Pêla ku min
dighîne
Peravên te
Vîn û evîne
....
Û bînvedana
dilînî yê min
Ramûsanek
şêrîne ...
Destê min li nav
destên te
Du newresên
dilşad
Di kiştî ya şahî yê
de
Yarî û tenazî ne ....
Ba û ba ...
Li nav pêla her diçin
Giravên xweşî yê
Seyran û avjenî ne ....
Kelecana bi dil dikeve
Ji nazdarî yên te ne
Û di rav û nêçîrê de
Tu masî yeke zêrîne ....
Ey mûm ya şahî û şevînê
Ez tenik bayê alenda me
Li gulên te
Ku di bişkivin sor ji xwînê ..
Ji xwe serxweşî ya min
Ji hilm û bîhna te ye
Û li nîva buharê
Ezim dildarê perwînê ....

VEDENGA BANGÊ

Banga te
Giha dilê min û
Li zozanê dilîniya
Vedeng da
Dengê totak û goyîna
Bi nalîna hevdîtinê
Dirêjî ya şevê didêran ...
Şev bê hîv bû
Û ji ewrên xema
Birûskên azar û kovana
Dirjî yan ....
Kul û derda dil digezîn
Li ber pêlên xulmaşî yê
Min rîsê keser û xwezî ya
Dispartin devê kêran ...
Bin kirasê elendê tenik bû
Li buhara civanê me
Û nikilokê tilî yê min
Kewnî birçî
Li gelî yê sînga te diçêrîyan ...
Hingorê bi sarî û sorî ya xwe
Em dorpêç
kirin
Li biyabanê
xewna
Du
kevokên
govî
Li hev
banîyan
.....
Û nermî
ya ba yê
siba
Dengê
me
Bi dildarî li hev vedigêran ....

Di sala 1994an de helbestvan Xemgînê Remo ji hêla Koma xanê ve li ser çîroka xwe ya bi navê "Cano Dîno" hate xelatkirin.

HEVOKA NE GOTÎ

Min hevoka xwe
Ya dawî
Ji xemgînî ya çavên te re
Negot ...
Dem bûrî ya û hêvî
Di nav badlîzokê payîzê de
Hilfirîn ...
Wê helbesta min divîya
Bo te vehînim
Di kûrahî ya dil de ma
Bilbilê şahî yê bê deng bû
Û awaz ji hev hilpekîn ...
Erê xanim ....؛
Ji bilî bê dengî yê
Te çi da min .....?
Her ku min li çavên te dinêrî
Hingivê reş bînî yê
Ji awirên te dirjîn ....
û min divîya
bi gulava vînê
dêm û lêvên te bişom
ku ji sibehên min re
tu bibî xweş bîn û baweşîn ...
belê canim ...
di bîrdanka min de
tu dar gulek hatîye çandin
ji lewra ev roj
bi rîsê keseran
min tevna rabûrî yên te
li darxistî
ey lehenga çîroka xemcivîn ...

AWAZA CUDAHÎ YÊ

Şevînê ....
Şev dirêjin can
Her şevanî
Şevdêrim ez
Ar û bizotê vîna te
Li şev dirêja
Min dibrêjin ....
Bi hêvî ya dîdarê
Min dil û çav
Li pacê ne
Tê kengî rû bidî
Şevê min
Hîverona tarî ya ...?
Çarenûsa min
Te nûsî ....
Bi pênûsa evîna xwe
Û şevek ji van şevîna
Yekem car
Min te ramûsî ....
Ji hingê were
Ez dilvanim
Ji evîna te neçarim
Gazî dikim xwedawenda
Fîxanê min
Bê hewarin ...
Bilûra dil bi nalîne
Ji cudahî yê cana
Meya mestî yê
Dinoşim
Da ez bighême şahî yê
Lê tenê
Ez û sîtavê te
Hemneşînin xivşe yê ...
Saza te divê
Ew çi saze
Ku dil bo te bijenîne ...?
Tenê min
awazek heye
vîna te pê
diderînim

KEVAL

Eger ku tu
hatiba
Egera min
Bi egerê nebû
Û dil sotin
Ne para me bû ...
Di şeveke şev şevînî
Gava ku ewir
Rû yê ezman diseyînî
Hîv winda dibe
Û tîrên birûska
Aso yan diderînî
Tu kevokek
Ji hêlîna xwe tertilî be
Bê û li keleha sînga min

Dînî
Tê çendî ciwan bî
Çendî şêrîn bî ....
Û bi egera
Eger pêk nayên
Ku tu ne dilvîn bî
Har û dîn bî ...
Wê gula evîna
min
Bê bîn bî ... û
Buhara min
ne rengîn bî
....

BÊHNA CÛDA

Bi
baweşîna
siba re
Bêhna te
Li derdorê ber belave
Ala û yasmîn bi fedîne ...
Te bêhin ji wan birine
Tenê bi reng gul mane
Û çi nav bo wan nîne ...
Nizanim ez
Bi çi rengê gulavê
Tu por û gerdenê
Bêhnî dike
Ku çûkên kolana jî
Li dûv te
Bi awaz û tilîlî ne ...?؛
Çinarê ...»
Te bisk û temberî
Tim ber bane
Û lerzîna sêva
Bo dildara şewşene
Bi baldarî
Tu dil dikelîne ....
Hiş bi carê çûye
Tenê di serî de
Min mistek dewê xave ...
Mamuste yê ...؛
Ez xwezî ya xwe
Bi wan şagirta tînim
Ku hinde caran
Destên tenî pîroz
Serê wan dixrîne ...
Û tilî yên nazik
Dêmê wan digezîne ...
Erê nazdarê ..
Nazî yên te bê sînorin
Û hez û dilînî yên min
Derya yên bê binî ne ...
De cana
Te pêl gelekî li hevdane
Kelek û keştî peçivî ne ..
Belê canê
Ez melevan bûn
Lê te hêz û
hiner
Pêk ve
têkdan
Û hêvî
Li giravek
hêminî maye
Ku tê bo min
Bibe perî û
Reşkonê keser û
xwezî ya
Ji vê navê hilîne
...

Destnivîs: 10 berhem, 3 çîrok, û 7 dîwanê helbestê ne çapkirî hene, lê li gor helbestvan Xemgînê remo diyar dike, li hêviya derfeta çapê ye.

JANA HÊVÎ AN

Jan û jan ...
Ta bi dawîya janê
Min da dûv leylanê
Keser û keser
Li dojeha guman
Min zevî yên sitrî ya
Bi jana hêvî ya
Di dil de çandin
Û hîva min xapînok
Yara min
Cadûgereke leyzok
Dilê min guloka rîs
Û teşî ristê
Bi çep û rast de badida
Li hişyarî yê
Di xewna de
Min tim sernavê evînê
Dixwend di çava de
Ba û ba
Ez diçûm di nav pêlan de
Û girava bînvedanê
Tim ji min dûr
Mest û mest
Avjenî di derya wê de
Poşmanî ye
Nêçîra nehinga ye
Lêdana tîrên sîxure
Cergê min jê birîn dare
Û reva li dûv rewrewkê
Tenahî ye
Bînvedana li biyabane ...

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kurdî Xweş e

Tawan: اتهام
Rewanbêj: بليغ, فصيح
Keya: مختار
Daniş: عارف, عالم
dawer: حكم, وسيط
Rik: حقد, ضغينة, كراهية
Jîngeh: بيئة
Terz: أسلوب, طريقة, طراز
Dek: حيلة, خدعة
Dexes: حسود
Resen: أصل, عرق
Zir: مزيف
Nebez: شجاع, جريئ

Mamik

„Li dibîstan e
Hîn cîwan e
Li bendan e
Divê bizane
Dew û dozan e!“
****
„Li dîwar e
Ne kewar e
Qor bi qor e
Wekî per e
Tişt li ser e
Kî nezane ew ker e!

Mamik bersiav 41ê
Mamoste- Pol- Pencere



Pendên Kurdî

- Bipirse ji kalê zemanan û xortê geryayî .
- Di xweşiyê de zêr zane û di reşiyê de zor zane .
- Destê di nav agir de ne wek ê di nav avê de ye .
- Derzya çavê xelkê dibîne, Şûjina çavê xwe nabîne .
- Serê du beranan di beroşekê de nakelin .
- Soldirû xwas in û cildirû bê kiras in.
- Sed heval hindik in, û dujminek gelek e.
- Şûjina çeŋvê xwe nabîne û derziya çavê xelkê dibîne.

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								■
2							■	
3			■			■		
4					■			■
5		■		■				
6								
7							■	
8	■						■	

Asoyî:

1- Paytexta Ermenistanê.
2- Bakurê Sûriyê (vajî).
3- Reh, of, hewa.
4- Rijî (Belawela), paşdaçek
5- Grad (Belawela).
6- Ala Kurdî.
7- Bê aqilî.
8- Zanist û bîrewerî.

Sitûnî:

1- Ola Ehlil-heq.
2- Destpêka şevê, zûkirin.
3- Agir (vajî), serbestî (vajî).
4- Jîjo (bi lêvkirineke din), endamê ji çogê ta kemaxê.
5- Dirinde (vajî), gemarî.
6- Agir, sazkirin.
7- Qab.
8- Ne mir, careke din.

Bersiv Hejmara 41ê

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	Y	Ê	R	Î	V	A	N	■
2	A	V	A	J	O	R	■	M
3	R	A	■	O	H	■	B	A
4	I	R	Î	J	■	D	E	■
5	S	■	D	■	G	A	R	D
6	A	L	A	R	E	N	G	Î
7	N	E	Z	A	N	Î	■	S
8	■	Z	A	N	Î	N	■	E

Peyva wendayî

Peyva wendayî ji 5 tîpan e, demsaleke salê ye.
Nêrgiz, binefş, nisrîn, gul, kulîlk, sorgul, cûrî, dar, giya, şilêr, ba, baran

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	N	Ê	R	G	I	Z	B	B
2	K	B	I	N	E	F	Ş	A
3	U	N	I	S	R	Î	N	I
4	L	R	G	I	Y	A	H	Î
5	Î	A	A	P	E	L	R	R
6	L	D	B	A	R	A	N	Û
7	K	S	O	R	G	U	L	C
8	Ş	I	L	Ê	R	G	U	L

Bersiva peyva wendayî 41: "Xanî"